

## Ala

Wek meseleyên din di meseleya alayê da jî serê partî û sazîyên Kurdan tevlihev e. Yekîtîyek, konsessûsek tine di navbera wan da. Hebe jî şeklî ye. Ne ji dil e. Ji bo çareserkirina pirsgirêkekê rojek tîn ba hev, rojtira din, yan ji ber zext û bandora dagirkeran, yan jî ji ber sistî û nejidilbûna xwe ji hev belav dibin.

Wan pîrî îmzeyan kom kirine û daxuyanîyan dane, êdî ew ji bîr kirine.

Yanê bi kurtasî bûne vîtirîner. Peyvên wan ên yekîtîyê, civînên wan, hema mîna "Bila dost di bazarê da bibînin."

Her partî, rêxistin helbet dê ala û sembolên wan hebin. Lê neku wan ala û sembolên xwe li ser milletî ferz bikin. Hela ji wan partîyan PKKê, ku hezar kirasê li xwe kirîye, ji xeynê yê kurdî, çiqas sembolên komunîstên îflaskirî hene danîne ser alayên xwe.

Bi salan ji rengên "kesk, sor û zer" ra gotin "rengên neteweyî", yan jî di şûna alaya neteweyî da bi kar anîn! Ev rengine kengê, çima bûne neteweyî? Kes nizane.

Di nava Kurdan da yê ku ji van rengan jî, yê ku ji rengên spî, mor, qîçk û nizanîm çî hez dikin jî hene. Ev millet e wê hez ji her rengî bike.

Û di ser da jî ev rengên kesk û sor û zer li Afrîkayê belkî alaya 10-15 dewletan e. Hetta li hin welatên Amerîkaya Latînî jî.

Bikaranîn û nêzîkayîya li alaya îroyîn a Kurdistanê jî şaş e.

Yan teqlîtê dagirkeran dikin, yan jî bi nezanî li her derê şaş û maş ew li ba dikin.

Li başûrê Kurdistanê jî wisa. Alayê li serê çîyan kolane, yê qirase çêkirine bi avahîyan da kirine.

Lêbelê Alaya Kurdistanê di nava alayên navneteweyî da li ba nabe! Heta li ba nebe, tu nikarî bêjî az xwedî ala me! Welat im. Dewlet im.

Li welatên Siwêd, Almanya yan jî li Swîsê binihêrên, alayên wan ewqas nayên ber çav, mirovên wan welatan ewqas ne alakolîk in. Lê neteweyên herî bingeh saxlem û pêşketî ne, Tu nikarî tilîya xwe dirêjê berjewendîyên wan bikî..

Adara par mamosta Beşîkçî ji bo semînarekê hatibû Bremenê. Ji Weqfa Beşîkçî ya Amedê mamosta Ehmed Kanî û Celal Temel jî hatibûn. Ehmedî gazî min kir, ez jî çûm. Ji bajarên din ên Almanyayê jî hin heval û hogir hatibûn.

Ez Bêşîkçiyî ji salên 70yan ji weşanxaneyê Komalê dinasim. Komalê pirtûkên mamostayî diweşand û belav dikir. Şîreta Mela Remezanê bavê min bû, digot; "Divê meriv xwe bide alîyê ku Bêşîkçî lê ye.."

Du sazîyên Kurd, ji bo semînarê "salona dawetê" kirê kiribûn. Guhdarvan zarokên xwe jî anî bûn. Heta dawîyê qareqar û vîlevîla zarokan bû.

Mîkrofon baş nedixebitî. Eyar dikirin, çend deqe şûnda car din xirab dibû.

Alayeke Kurdistanê bi bandê bi dîwarê platformê va daliqandibûn. Alayeke din jî bi heman şêweyê bi pêşîya maseya pilatformê va.

Tiştê balkêş ew bû, ku ew ala carê carek xar dibûn, dişimitîn diketin xarê. Du kesan her carê diçûn wan alayan rast dikirin, dihatin li şûna xwe rûdiniştin. Ew çend deqe şûnda careke din xar dibûn û dişimitîn.

Rastkirin, şimitîn û karesata organîzasyonê heta dawîya semînarê bal û konsantre bi me ra nehîşt.

Li dawîya semînarê ez çûm ba Beşîkçiyî, min bi destê wî girt û gotê:

"Xoce binihêr! Ev nîvsedsalekê ye tu bêrawestan rê nîşanê Kurdan didî, şîretan li wan dikî. Mixabin em hîn nikarin mîkrofonekê eyar bikin û du alayan daliqîn! Em dê çawa dewletê ava bikin?"

Wi ti tiştê negot.

Ji xeynê awirên bi mij û bi wê kena xwe ya dilnizm

19.11.2018, Berlîn

Ewdil Ararat



*Ez Bêşîkçiyî ji salên 70yan ji weşanxaneyê Komalê dinasim. Komal pirtûkên mamostayî diweşand û belav dikir. Şîreta Mela Remezanê bavê min bû, dogot: "Divê meriv xwe bide alîyê ku Bêşîkçî lê ye.."*



*Piştê sal û deman çar kevnehevalên ji dema Komal û Rizgarîyê. Şêxmûs Özzengîn, Ez, Husên Duzen û Ehmed Kanî. Husên di salên heftêyan da li Savaştepeya Balikesîrê, di dibistana bilind a mamostatîyê da dixwend. Dibistana wan di destên faşîtan da bû. Rêya min carekê pê ket, çûm serdana wî. Husên niha li Hamburgê doktorê psîkolojîyê ye. Êh! Mamostatî û psîkolojî jî zêde ji hev ne dûr in.*



*Bi hatina Celal Temel ra em bûne pênc.*

*Mamosta Celal, di salên heftêyan da mamostayê matematîkê bû. Piştê ku bû malnişîn li ser dîroka Kurdistanê pirtûkek nivîsî. Matematîk û dîrok ji hev dûr bixuyên, nêzîkê hev in jî. Her du jî hesab û kîtab in..*